

Nûh li ser KORONA

KURMANJI
JMAR 6
NÎSAN 2020

Dema ko hûn nexweş bibin bi covid-19

Piraniya kesên ku bi vîrûsa korona hatine vegirtin ew nizanin heger nexweş bûne. Lê hin mirov nexweş dikevin û hewceyê lînirînê ne.

Piraniya kesên ku bi nexweşiya covid-19 vegirtîne ew hinekî nexweş dibin. Berkî ku hûn tenê bi sivik bikûxin an germ bibin. Yê din gelek nexweş dibin û hewceyê lînirîna nexweşxaneyê ne.

Heger hûn tenê hinekî nexweş bibin hûn dikarin li navenda tenduristiya xwe an li 1177 gazî bikin. Ew pir caran dibêjin ku divê hûn li malê bimînin heya ku hûn sax dibin. Gava ku hûn sax bibin, divê hûn du rojên din li malê bimînin berî ku derkevin derve.

Ger hewceyê lînirîna nexweşyê hebe, girîng e ku hûn li pêşî telefon bikin û neçin navenda tenduristî yan nexweşxaneyê. Rêbazên taybet hene ji bo ku karmendan çawa lînirînê li kesek ku covid-19 bêra hebê. Girîng e ku mirov li yê din belav nekin.

Her kes yê ku pir nexweş bibin û pir zehmete ko nefesê bibin bila gazî 112 bike û ambûlans werê bibê. Karmendên ku di ambûlansê de kar dikin kincên parastinê li wan hene. Tenê yê nexweş dikarê bi wan ra herê.

Nexweşxaneyên li Kalmar û Västervik ku nexweşên bi covid-19 distînin. Girîng e ku em li hevdu venegerînin, ji ber vê yekê kes nikare serdan bike li nexweşxaneyê.

Ew ji bo karmendên wîlayetê de xebatek dijwar e. Ew gelek kar dikin û hewce ne ku ji bo hevdu alîkariyê bidin hev. Tê xwestin ku bêhtir hemşîre bi kar bikin ji bo kar sivik bibê, û ji bo karmendan li havînê rojên azad bibin.

Di demên paşîn de, pirsgirêk bû li ser nexweşxane û xaniyên şaredariyê alavên parastinê bistînin. Lê naha baştir e.

Naha alavên parastinê ji bo karmendan û nexweşan li nexweşxaneyan hene, dibêje Martin Olsson, serokê karûbarê herêmî li Kalmar. Em dixebitin ku hûn em bêhtir alavên parastinê bistînin, da ku em karibin xwe îdare bikin heya ku paşê gelek kes jî nexweş bibin.

Dibe ku gelek nexweş bibin di pêşerojê de li wîlayetê. Lê nexweşxane û şaredarî karibin wê derbas bikin. Naha çihê her kesî ku hewce lînirînê heye.

A rast:

Covid-19 navê nexweşiya dema ku hûn bi vîrûsa korona vegirtî bin.



Tevkariya krîzê wîlayeta Kalmar, tevkariyek di navbera hemû şaredarên wîlayetê ye, Navçeya wîlayeta Kalmar, Desteya Rêvebiriye wîlayeta Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de hene.

Kalmar kommun



facebook.com/krissamverkan.kalmar